

# Şoreşa di binyata de

Konferansa 1emîn, 6-7 Cotmeh 2018, Frankfurt



Network  
Women  
Weaving  
the Future

- Bername-

ROJA 1'emîn

Vekirin

## Rûniştina I: Krîza Baviksalarî û Şerê Wê Yê Sîstematîk Li Dijî Jinê

### 1. Zîrveya Pergala baviksalarî: Dijminahiya Kapîtalîzmê ya li dijî Jinê

Bi qasî ku Jin di kapîtalîzmê de rastî kedxwariyeke kûr û qatqatî hatine di ti demên din ên dîrokê de nehatine. Bi netew-dewletê re kapîtalîzmê bûye ifadeya herî bi dezgeh ya serdestiya mêr. Lewre di dema pergaltîrîyê de civaka girêdayî çanda dayik-jinê ya ku wekî antîpoda wê ye ji holê rakirîye. Baş e, wisa be em tîkiliya di navbera pergala baviksalarî û kapîtalîzmê çawa dikarin pêname bikin? Civaka serdestiya mêr di serdema kapîtalîzmê de çima û çawa derxistine asta bilindtirîn? Û tîkoşîna azadiya jinê ya ku karaktereke antîkapîtalîst pê re nîne, şensê wê heye gelo?

### 2. Krîza pergale ya sedsala 21emîn: Di çarçoveya azadiya jinê de derfet û zehmetî

Pergala cîhana kapîtalîst bi qeyraneke binyadî ketiye sedsala 21emîn. Pergal, li gorî karaktera xwe bi diwartirkirina êrîşên xwe yê li ser dijberên xwe hewlîde ji krîzê derkeve. Bi taybetî jî em dikarin qala şerekî sistematîk li dijî jinê bikin. Lê qeyran her tim jibo hemleyên xurt di nava xwe de derfetan dihewîne. Di Krîza pergala baviksalarî de di vî çarçoveyê de jibo azadiya jinê kîjan risk û derfet hene? Divê em qeyrana pergale ya heyî çawa binirxînin?

### 3. Pêwendiya zayendperestî û kapîtalîzmê bi teslîsa pîroz re

Di modernîteya kapîtalîst de desthilatî, li gorî alavên birdozî her tim bi awayekî xwe ji nu ve dihilberîne: Zayendperestî, netewperestî, olperestî û zanistî. Hebûna xwe bi esasî li ser van lingan dide rûniştandin. Dema ev her çar di nav pêwendiyêke saxlem de ne jî hîmê hemû şiklên desthilatîyê zayendperestî ye. Di navbera zayendperestî û her sê lingên din yê modernîteya kapîtalîst de tîkiliyeke çawa heye? Û di tîkoşîna li dijî zayendperestiya civakî de divê nêzîkbûna li hember netewperestî, olperestî û zanistperestî çawa be?

## Rûniştina II: Atolye

1. Zêdebûna rejîmên faşîst û bandoran wan li ser jinê
2. Komkûjîya Jinê, tûndiya cinsî û xweparastin
3. Ekolojî
4. Civakên dayiksalarî û nasnameyên civakî
5. Polîtîkayên penaberkirinê, koçberiya bi zorê û şer
6. Mêtinkarî, modernîteya kapîtalîst û bandora li ser jinê
7. Jinkirina feqîrtiyê û aboriya komûnal
8. Jin û çapemeniya alternatîf

## Êvar : Mûzîk

### ROJA 2' yemîn

## Rûniştina III. : Têkoşîna Azadiya Jinê: Ji Fisê heta Kobanê, ji Minbicê heta Reqqayê

### 1. *Felsefeya li piş qûtbûna ji pergala baviksalarî*

Em çawa gihaştin encama ku azadiya jinê ya ji Fisê heta Reqqayê rê hatî ji azadiya welatekî bi rûmettir e? Rizgariya jinê û kûştina merê serdest jibo derbaskirina pergala baviksalarî çi qasî esasî ye? Netewa Demokratîk û Sosyolojiya Azadiyê di avakirina pêşeroja me de derfetên çawa derdixe holê? Jineolojî di nav vê de xwedî wateyeke çawa ye?

### 2. *Avakirina pergala konfederal ya jinê: Bikaranîna felsefeyê*

Pir pêwiste ku em deskeftiyên xwe bigihîjînin pergaleke domdar û berdewam. Lê jibo vê yekê divê tiştêkî din deynin cihê stûnên herî girîng yê pergala baviksalarî. Girîngiya rêxistinbûyîn, perwerde, aboriya komûnal ya ekolojîk, girîngiya saziyên derveyî dewletê (tevî pergala hevserokatiyê) û rêyên jiyankirina wan.

### 3. *Çima ne parastin lê xweparastina jinê: Mît, riyakarî û heqîqet*

Hem tekedestiya bi darê zorê ya şiklên cûda yê dewletê di dîrokê de û netew dewletan, hem jî şiddeta bêsinor û zêde û analîza kêma ya rêxistinên şoreşger nêzîkbûna me ya xweparastinê teşedaye. Qey me qet xwe ne parastiyê, an jî divê kesên din me biparêzin? Ger wisa be çima? Û kî şiddetê li ser me ferz dike? Divê em nêzîkbûna xwe ya derbarê xweparastinê de çawa terîf bikin û îfade bikin? Jibo ku venegere şiklê şiddeta baviksalarî ya ku em naxwazin divê em tedbîrên çawa bigirin?

## Rûniştina IV.: Herêmên cûda û tîkoşînên gerdûnî: Tevgerên jin tecrûbeyên xwe parve dikin

### 1. *Ji qralîçeyên heydûtan ber bi çeteyên helesor: Berxwedana poskolonyal ya jinên Hîndîstanê li dijî tûndiya mêr û tecawûzê*

Hîndîstan, yek ji dewleta ku lihevketina zayendperestiya civakî û çanda jin herî zêde berbiçav e. Li aliyekî çanda xwedavenda dayik, li aliyê din şewitandina jinên bî, kûştina pitikên keç di malzaroka dayikê de, tecawûzên bi kom. Li welatekî ku heta berî demeke kurt jin pîrozbûn, çawa dibe ku dijminahiya li dijî jinê evqas zêde bû? Para kedxwariyê divê mijarê de çi ye? Û jinên Hîndîstanê di roja îroyîn de li dijî zayendperestî û hemû şiklên kedxwariyê di warê teorî û pratîkê de çawa li ber xwe didin?

### 2. *Jiyane reşîk yê şîna wan nehatî girtin û zayendperestiya serdestiya spî*

Li DYA yê kûştinên bêdaraz yê reşîkan, şiddeta polêsan, newekheviya sistematîk û cûdakarî îfadeya rastiyê gerdûnî li herêmê ye: Di nav pergala bio-polîtîk ya hegemonyayê de ên jiyana wan 'bêrûmet' hatûn kirin, yê şîna wan nayê girtin, yê ku ji komkûjiyan re kirine hedef. Ev ew kesên ku pergale ji kokê bihejînin in ger ku azad bibin. Bi mezînbûna tevgera BlackLivesMatter ya ku bi pêşengaiya jinan hatî damezirandin re bilindbûna deshilatîya siyasî ya ku sembola serdestiya sipiyane dikare tesadûf be?

3. *Hişyarbûna Keçên Xwedawendan: Li Rojhilatanavîn Şoreşa duyemîn ya jinan*

Li bakûrê Sûrî Atargatis, li Mezopotamya Îştâr, li nav gelên Îranî Anahita, li Kurdistanê Star: Li Rojhilata Navîn ya ku çanda xwedavenda dayik jiyankiriye, jin Duyemîn Şoreşa Jinê dihûnin. Lê li ser vê erdnîgariya ku baviksalarî xwe bi cîh kiriye di roja îroyîn de di navbera serdestiya mêr û azadiya jinê de têkoşîneke bêhempa dimeşe. Jiber dîrokiya vî warî têkoşîna azadiya jinê ya li Rojhilata Navîn dikare wesfeke gerdûnî hilgire? Li vir di nav şoreşê de şoreş wateyeke xwe çawa heye?

4. *Şopdarên Gabriela: Tifaqa Jinan di teorî û pratîkê de*

Jibo têkoşîna azadiya jinê ya bi bandor li dijî pergala baviksalarîyê pêwistî bi hevpariyê û tor avakirinê heye. Lê tevî cûdahiyên di navbera me de em çawa dikarin werin ba hev hevpariyê bikin? Têkoşîna hevpar li ser kîjan prensîban pêk tê, yekîtiya nêzîkbûneke çawa pêwist e? Zehmetiyên ku tifaq bi xwe re tîne çi ne, destkeftiyên bi xwe re tîne çi ne? Bi parastina taybetmendiyên xwe modeleke rêxistinbûyîna hevpar di pratîkê de çawa tê bi pêşxistin?

5. *#NiUnaMenos: Em ê yeka din kêr nebin*

Qetla jinan li Amerîka Latîn ji zu ve gihaştîye asta komkûjiyê. Jinên ku bi salane jibo qetla jinan ji aliye dewletê ve were dîtin û kûjer werin ceza kirin têkoşînê didin, bi berçav girtina rastiya ku dewlet şirikê sûc e, gihaştîne encama ku; jibo pêşî lê girtina komkûjiya jinê rêxistinbûyîneke bi hêz pêwist e. Tegera Ni Una Menos ya ku ji Arjantînê derketî îro li tevahiya parzemînê û li asta navneteweyî xwe bi rêxistin dike. Vêca em çawa dikarin komkûjiya jinan bisekinînin? Pêwistî bi rêxistinbûyîneke çawa heye?

6. *Vejinê çanda şoreşger: Rêxistinbûyîna jinan li Efxanîstanê*

Efxanîstan, Îran, Tîrkiye – dawiya 1970an û sere 80yan, salên ku civak û bi taybetî jî jinên Rojhilata Navîn potansiyeleke mezin ya şoreşger bi dest xistibûn bûn. Hêzên hegemonîk bi derbeyên leşkerî, komên îslamî û qetlên siyasî bersiva vê yekê dan. Van hêzan bi maskeya demokratîkbûnê anjî di bin navê “têkoşîna li dijî terorê” ya ku 2001an dest pê kirin di teşwîqa “şerên navxweyî” yên bi xwîn de bi awayekî aktif cihê xwe girtin. Di vê rêyê de li dijî potansiyela şoreşger ya jinê şerekî taybet bi pêş xistin. Li vê erdnîgariyê kolekirina jinan tê wateya ji holê rakirina çanda şoreşger. Lê jinên Efxan di bin şert û mercên dijwar de bi vejînkirina çanda xwe ya şoreşger li dijî kolekirinê têkoşînê dimeşînin.

## **Rûniştina V. Oturum: Şoreşa di binyata min de: Em pêşeroja xwe bi hev re bihûnin**

Levketinên vê demê ne tenê rê li ber êşên mezin, şiddet û koçberkirina milyonan însan ji ser axa wan vedike, herwiha şensê ku em rêya jiyana xwe birêsin dide ber me. Parametreyên pêşdîtinên me çi ne? Di derbarê paşeroj, îro û pêşeroja xwe de em ji her demê bêhtir agahdarin. Bi her yek ji van parametreyan em çawa dikarin tora xwe ava bikin? Divê nêzîkbûna piştevanîyê were gûhartin, lê em çawa dikarin pratîka xwe, afirandinên xwe, hewldanên xwe û têkoşîna xwe hevpar bikin? Em çawa dikarin bi hev ve bihûnin?

- Tegera azadiya jinên reşîk- Jinên reşîk rastî zordestiya nîjadperest a hovane û halê wê yê di şiklê kedxwariya koledar ya arkaîk û gelek şiklên êrîşên girêdayî wê hatin. Di heman demê de jibo azadiya xwe şer kirin, û hîna jibo jinên şoreşger ên cîhanê re dibin îlham. Vêca rêya niha li pêşiya me kîjan e û em çawa dikarin têkiliyên xwe xurt bikin?
- Rengên wan yên bi mirês taswîra têkoşîna jinên Hîndîstanê ya li dijî polîtîkayên neolîberal yên kapîtalîzmê û êrîşên berfireh yên baviksalarîyê dike. Jibo piştevaniya cûdahiyên qada

pêwîst çawa ava dikin?

- Jinên Erebaştanê yê li dijî hegemonya kapîtalîst hêza xwe ya gerdûnî û herêmî wenda kirî, û jiber bavîksalariya hegemonîk ya Erebaş ya gelek hişk du qet jidestçûyîna azadiyê jîyan kirin. Em çawa dikarin sînorên di navbera jinên li herêmê xêzkirî li paş xwe bihêlin û bi hev re tevbigerin?
- Di bin oldarî, feodalîzm, netewperestî, û karesata jiber şerên berdeyam dikin de-koleya koleyan-Jinên Kurdistanî hemû formên bavîksalariyê red dike û bilind dibe. Dema hedefên hevpar dibe mijar jin dikarin çawa bi hev re tevbigerin?
- Jinên daristanên baranê, Zapatîstayî ji me re heman tiştê bi awazeke cûda dibêjin. Têkoşîn û berxwedana jinên daristanên baranê û yê jê wîrdetir berdeyam dikin. Li ser erdê ji me dûr in, lê di nêrînê pir nêzîkî me ne.

Agahiyên teknîkî

Dîrok: **6-7 Cotmeh 2018**

Saet: **09:00**

Cih: **Avahiya Xwendevanan ya Zanîngeha Goethe (Studierendenhaus an der Goethe Universität), Mertonstraße 26, 60325 Frankfurt am Main**

Zimanên ku wergera simûltane were kirin: Kurdî, Îngîlîzî, Almanî, Tirkî, Îtalyanî, Îspanyolî, Frensî  
Bûhayê tevlibûnê: 30€ (firavîn, qehwe û çay di nav de); 50€ bûhayê piştewaniyê (Ger hûn nikaribin bûhayê tevlibûnê bidin ji kerema xwe re bi me re bikevin têkiliyê)

Qeyd dê 5 Cotmeh saet 17:00'an dest pê bike

Cihê mayînê: Herî zêde jibo sê şevan li gel malbatên Kurd û malê hevalan mayîn. Wekî din jî bi bûhayekê mûnasîb cih li pansiyonê hatine veqetandin.

Qeyd

Ji kerema xwe re heta **15 Îlon 2018** qeyda xwe bi rêya emailê bikin:

**[womenweavingfuture@riseup.net](mailto:womenweavingfuture@riseup.net)**.

Di mailê de van agahiya bidin: Pêwîstî bi cihê mayînê heye an na, hebe jibo çend şevan, pêwîstî bi mêzekerîna zarokan heye an na û li kîjan herêmê dijîn.

Jibo bername û bêhtir agahî, nûçe û bangewazî derbarê konferansê de malpera me bişopînin:

**[www.revolutioninthemaking.blogspot.eu](http://www.revolutioninthemaking.blogspot.eu)**